En: Ferhad IÇMO

PIŞTÎ ÇI !

HELBEST
1995

PIŞTÎ ÇI..!
Helbestvan: Ferhad Içmo
Derhêner û kombiyûter: F. Içmo

Çapa dîjîtal
Sîrwan Hecî Berko
Malpera Amûdê
www.amude.de
info@amude.de

Hamû mafên çapê parastî ne.
© Ferhad Içmo û malpera Amûdê (05/2002)

DIYARÎ

Ji bo wan kovarên ku ev Helbestên min li ser rûpelên xwe weşandine .

En: Ferhad IÇMO
QAMIŞLO
1995

NAVEROK

Piştî çi 06
Binefşa min 08
Çiyako 11
Em tev Kurdin 13
Bîst û sê sal 15
Evîndar 16
Xwedêyo 18
Em 20
Kurdistan 21
Barzanî 25
Bûka Kurda 27
Daxên evînê 28
Min bawer nedikir 29

PÊŞGOTIN

Bi sedên sala zimanê Kurdî hatiye jibîrkirin û talankirin û qedexekirin, lê nemirî ye û windanebûye,ji ber ku Bazê Stiranê Bi baskên awaz û helbestan ew parastiye.

Di qûnaxên tarî de , dema tinebûna dibistan û dezgehên ragihandinê , helbestvana bi şêweyekî nazik , bûyerên dîrokî û çîrokên kew û çiya , li ser rûpelên hişê gel nivîsandine.
Di rojên teng de, berî bazdanê, Kurda radihişt tivingê û helbestê û berê xwe didan çiya.
Ji ber van egeran, helbest bûye nasnameya gelê kurd û navnîşana Kurdistanê.
Heger ne ji helbestê ba, wê zimanê kurdî li ser darbestê ba.

Ji dil û can ez helbestên LÊMIŞTA ZOZAN, PIŞTÎ ÇI, EVÎNA TE, LANDIK û PELÊN SIPÎ dikim diyarî ji malpera (amude.de) re di gel hêviya razîbûna xwendevanan.

FERHAD IÇMO
QAMIŞLO 14-05-2002

PIŞTÎ ÇI

Min omîdek di gel hêv'ya,
Ji mêj hebû,
di wan çava ....
min peyala, meya lêva ,
wek serxweşa,ji mêj noşand,
di nav rava ....
ka ew omîd,ka ew peyal ..?
ka helbesta,dêmên bi xal.?
ka seyrana,çavên zelal .. ?
li sikaka ,te firotin ,
bi erzanî ....
ji nû îro
min xweş naskir,erê rast bû,
min gul kirî,di xewnê de,
bi nezanî ....
bi poşmanî ....
ma çi bêjim..!?
pişti çi..pişti çi ..!!

* * *

te bi hêsra,
kulîlka rû ,bo rêwiya ,
xweş xemiland....
wek perwana,
min koça xwe,ji baxê dêm,
sivik hiland ....
kî bihirî ,ji baxê te ,
gulek çinî ....
te jîn li min, îro kir'ye ,
reş wek tenî ....
lûsê hêvya ....
omîda min ,
lê nenivya ....
sitêra dil , ji ezmana ,
di şevên reş,
çizû rijya ....?
ji nû îro ,
du çavên te,
weke kêla , gazî dikin ,
hêvyên kevnar .... !?
wek keleka ,
bê kelekvan ,di nav pêla,
ji nû îro , tu bandike ,
li min hewar ....!?
ma çi bêjim ,
pişti çi....pişti çi.....

* * *

te çi got û

min got bila ....
te ez kirim , pelek tarî
bê nîşanim ,
perîşanim , di ferhenga
êş û kula ....
bi civana ,
te windakir , li pêşya min
rêça şarê ..
baxên gula ....
ji kerwana ,bi dûr ketim ..!
wek revenda ,
girêdayî...li şûnwara....
wek kulîlka ,
dêm çilmisî ...di bihara....
di nav xewna ,
li hêvya te , ez raketim ..!
ji nû iro ....
wek mêkewa , di nav dava
çavên şermîn , bi tolazî ..!
rojê carkê ..
li dilê min , dikin gazî ..!
ma çi bêjim ,
piştî çi ..... piştî çi .....

* * *

ew xelata , min hêla bû
ji bona te ,
doh min dîtî , li ser tinga..!
ew sorgulên,me tev çandin
di şevên reş..
me rondik,li wan barandin
doh min dîtin,
li dîlanê....di bin linga ... !
ew nameyên ,
bi hêstira , min dişandin
doh min dîtin ,
di nav arya,dor êzinga... !
ji nû îro ..
tu bû gulek, pel çilmisî
di payîzê ..
li baxê min,bi mêvanî... !
ji nû îro ..
hat bîra te,
di nav pêlên,derya xema
ji bona te..
ez bûm her dem,kelekvanî..!
ma çi bêjim ..
piştî çi ... piştî çi ....

11.9.1993

Ev helbest di kovara - ROJ - de ,hejmar: 3
Sal: 1993 li QAMIŞLO hatiye weşandin .

BINEFŞA MIN

Binefşa min ...
min di sînga , keleşgewra
alên pêtê ,
serhildana , evîna xwe
tev çikandin ....
te bi tenê ,
weke hinga , li ser gula
alên êşa , alên kula
di dilê min ,
ji mêj çandin ....
te bi tenê ,
ew helbestên , ne hûnayî
ji nav herdû , lêvên zuha
zû derandin ....
te bi tenê ,
xewnên kevnar û veşartî
ji zindana dilkê xemgîn
wer revandin ....
te bi tenê ,
ew bilbil û perwanêt min
li ber bejna , evîna xwe
tev gurandin ....
Binefşa ... min
Rûgeşa ... min
Laleşa ... min

* * *

Binefşa min ...
heger rokê ,
te herdû hûçkên xeftanê ,
xwenî sipî ,
bi kulîlkên ,
gelyên çiyayê , Kurdistanê
xemilandin ....
heger rokê ,
şemalkên bihara WANê
herdû perdên , pencera te
xweş livandin ....
heger rokê ,
te omîd û hêviyên xwe
li nik arê ,
finda dawya şevên tarî ,
nenivandin ....
û... bê...dengiyê ..,
ewrên xwenî , reş û tarî ,
li dora te ,

tev civandin ....
xweş zanibe
ew bêdengî , dilê mine.
jê ... netirse ...
bê dengîya , dilê xemgîn ,
hezar pirse ....
jê .... netirse ....
Binefşa ... min
Rûgeşa ... min
Laleşa ... min

*** * ***

Binefşa min ...
Li ser rêka , evîna te
ez westîyam ,
ji hewara ....
nêçîrvana , li nav baxa
bilbil kuştin
kulîlk weşiyan,ji dor balla
gulyên dara ....
ez birîna , hembêz dikim
li dîlana .. ,
li seyrana .. ,
di nav pêtên,mûma serxweş
her êvara ....
evîna ... min
nalîna ... min
birîna ... min
li hev geryan ,
weke mara ....
heyv û sitêr ,
ji ezmanê , şahiya min
hatin xwarê .
berf barîya ,
li şûnwara ....
lê .. ez .. çibkim ..?
evîna te , cuda nabe ,
ji êş...û..
kul û azara ....
Binefşa ... min
Rûgeşa ... min
Laleşa ... min

*** * ***

Binefşa min ...
bi wan biskên , li ser dêma
nenixumîn ,
xemla xalê ....
şerme heger , bihar carkê
ji bilbil re , pêkêş neke

yek helalê ....
şerme heger ,
partîzanek , li meydanê
di nav arê , ceng û şer de
bazde ji bin ,
siya alê ....
bawernakim , te bihêle
ê ji meya , herdû lûva
binoşîne ..
yek peyalê ....
Binefşa....min
Rûgeşa....min
Laleşa ....min

*** * ***

7-11-1993

Ev helbest di kovara -ROJ- de hejmar:4
Sal:1993 li QAMIŞLO hatiye weşandin.

ÇIYAKO

Çiyako .... !
bê...gundo...
her dem li te ,
mij û ewre ....
tu ji pengên ..berfa sala ..
por sipiye,
serî gewre ....
çima îro .... ?
ji bo jar û perîşana..!
bo beytikên , baskokirî
li ber serma... zivistana
tu bê çare ,
tu bê zewre ....
çima îro .... ?
tu dergehê , wan şikefta
bi gulokên..
berfê digre ....
ma ne şerme .... ?
di hembêza...te gernasî
evînîka....
dilan ... bimre ....
bê ... gundo ... çiyako...

* * *

çiyako .... !
bê ... dengo ,
çend evîndar , te parastin
ji kuştinê ....
diz û keleş , te vedşartin
dema dighan,
ber girtinê ....
tu bû hêvya , dost û yara
roja karê ,
revandinê ....
çima îro ...
tu bê denge ...?
tu nabîne ,
hêsrê çavên , pîr û kala
tu nabhîze ,
nalenala , li mendala
bi hezara ,
di wan gelyê tenî wêran
va gihane ,
ber mirinê ....
bê .... dengo ....
çiyako .....

* * *

çiyako ....
bê .... sozo ....
xelk dilketin , heyva li bin
zulfên siya ....
hin dilketin , zîv û zêr û ...
keryên miya ....
em bi tenê ,
ji sed sala ,
li hêvya te , mane rêwî
li ser riya ....
em bi tenê ,
raketine , li ber ava
wan kanîya ....
em bi tenê , dil ketine
mirna li ser ;
pozên çiya ....
tenê carkê ,
wek mêrxasa , berfê hilîn
ji ser piya ....
bê ..... sozo ....
çiyako .
bê ..... dengo ....
çiyako .
bê ..... gundo ....
çiyako .

* * *

26-9-1993

Ev helbest di kovara -ROJ-de hejmar:3
Sal:1993 li QAMIŞLO hatiye weşandin.

EM TEV KURDIN
EM .....KURDIN ?
....TEV KURDIN !
EM TEV KURDIN

Hek tu sor be,
hek ez zerbim ,
hek tu şînbe ,
hek tu keskbe ,
hek ez gewrbim ....
hek tu ewrbe , li ber aso
ezê dîsa ...
qaz û qerbim ....
di dawyê de ,
wek kulîlkên gulistana
hek tu kurd be.?
ez jî kurdim....
ez jî kurdim....

*** * ***

tu ji jor be ,
ez ji jêr bim....
tu ji rast be , tu ji çep be
tu karker be ,
yan rêncber be ,
ez bi şûr û ...
taca zêr bim ....
tu sitêr be , li ezmana
ji dîtna te ..
ezê têr bim ....
di dawyê ..... de
di rojên şer û talana
hek ez kurd bim .?
tu jî kurde....
tu jî kurde....

*** * ***

tu Kurmanc be ,
ez Sorî bim....
tu Zazî be yan Fîlî be
tu Horî be ,
ez Lorî bin....
tu zozanê Kurdistan be
ezê .... berfa
li jor wî bim ....
di dawyê de,
di tarîka , wa zindana

hek tu kurd be .?
ez jî kurdim ....
ez jî kurdim ....

*** * ***

tu j' Kerkûk be
ez ji Wanê ....
ji Amed be , ji Efrîn be,
ji Hewlêr be.
ez ji Banê ....
hek tu gul be , li ser zozan
ezim hêsrê ,
tev baranê ....
di dawyê de ,
li nav axa goristana
hek ez kurd bim . ?
tu jî kurde ....
tu jî kurde ....

*** * ***

ez nezan bim,
tu rêzan bî ....
ez şivan bim ,
ez serwan bim,ez gavan bim
tu serwer bî ,
yan hozan bî ....
hek ez şûr bim ,
yan ez top bim ,
tê bi minre ...
partîzan bî .....
di dawyê de ,
li ser rêka , pak'rewana
em tev kurdin....
em tev kurdin....
em tev kurdin....

*** * ***

23-3-1992

Ev helbest di kovara -ROJ-de hejmar:6
Sal:1994 li QAMIŞLO hatiye weşandin.

BÎST Û SÊ SAL

Bîst û sal , min borandin
li ser rêka evîna te,
bîst û sê sal,wek revenda
min borandin,
bi rêbarî ....
bîst û sê pêt,
di sermê de ,
li bin tilyên,gewr û nazik
bîst û sê pêt,min ji tirsa
kirin arî ....
bîst û sê gul,
te revandin , ji baxê dil
dil li xwezya,bû zindanek
sar û tarî ....
bîst û sê sal ,
bûn tizbiyek ,
di nav tilyê tenî serxweş
ew tizbî jî , te windakir
bi ser sarî ....
te li dilê jar û riswa
bîst û sê êş ,
di gel qeftek,birînên sor
kir diyarî ....
li ser kêla evîna te
bi kulîlka ezê deynim
de pîroz be ,
li te ev gor ,
de pîroz be , kefenê te
de pîroz be ...
hezar carî .....

9-11-1993

EV helbest,di kovara -ROJ-de hejmar:7
Sal:1994 li QAMIŞLO hatiye weşandin.

EVÎNDAR

Evîndarê wan hinarkê
bi rondika xunavkirî
dîlbera te li şûnwara
îro maye mêwa tirî
ji xew rabe sitêra te
nayê xwarê şerme girî
kerwanê doz û hêviya
bi rêket û wa bihirî

*** * ***

ji xew rabe jiyan cege
lê ji wêna tu bê pare
dîlbera te gulek sore
bê hêvî û bê bihare

çav ji hêsrê êşa kevnar
tim sotî û birîndare
gulistana xewn û hêvya
alîk rûte yek beyare

*** * ***

di dîrokê tu bi deng bû
çima îro maye winda
te bi xwîna xwenî pîroz
navê yarê ji mêj hilda
arya dilê sotî bûye
kilê çavên bûkên kurda
dîlbera te wa dinale
di nav têl û lel û perda

*** * ***

dîlbera te gulek sore
bê heval û bexçevane
roka geşe li ezmana
heyv û sitêr jê windane
perîşanin perwanê wê
bê kulîlkin li deryane
pêwanên wa herdû çava
hin girtîne hin revyane

*** * ***

evîndarê roka vînê
ji xwe rabe rok çû ava
na pişkive baxê jînê
bi cobarê hêsrê çava
dîlbera te naxemile
bi nalîn û qîr û lava

nêçîrvanê xwen û xwezya
li vê jînê nabe zava
*** * ***
16-2-1992

Ev helbest di kovara-GURZEK GUL-de Hejmar:15 sal:1992. li bajarê QAMIŞLO hatiye weşandin.

XWEDÊYO

Xwedêyo .....
te dil kirye , hêlînek sar
ji bo jana .....
ne xuyaye , li pêş çava
deng û şopa ,
wan kerwana .....
li nav ewrên , evîna te
wek sitêrka ,
ez windame .
payîza .. dil ,
di nav xewna,nehat şuştin
bi omîda ,
hêsra ewrên ,
zivistana .....
*** * ***
xwedêyo ..... !
min bi xewna , jîn û vînê
weke tûmê kelemperê
Payîz bûrand ,
Kanî bihar ..... ?
dem û sal û meh û dewran
ax û av û bayê zozan
bi neyarî ..,
hezar carî ..,
wan ez hiştim,
bê dost û yar ..... !
ez ji kenê , lêvên jînê
bi dûr ketim .
ji peyala , hêsrên yara
mame bê par ..... !
ez li jînê bê jiyanim .
li dîlanê dil kovanim .
li asoyê çayê hêvya
dikim gazî ,
dikim hewar .....
*** * ***
xwedêyo ..... !
tenê carkê , ji mir bêje
bo çi wilo ,
te dil daye , evîndara
ji bo kulla .....?
ma ne şerme ,
di hembêza..biharkan de
bête sotin ,
dêmên gula ..... ?
sed mixabin ,
ku du çavên , bihara dil

nexemilin ,
bi reş kila ..... !
tu bi tenê ,
xweş dizane ,
çima axa .. goristana ..
bi nazdarî , hembêz dike
veşartiyên ..
derya ... dila ..... ?

*** * ***

1-11-1994

Ev helbest di kovara -GAZÎ- de hejmar:9-10
Sal:1995 li DIHOKÊ , hatiye weşandin.

EM....

Em bi çayên Kurdistanê
bilind tirin ji sitêra.
derya Wanê em nag'herin
bi Baykal û Qezwîn pêra.
Baba Gurgur bihatire
ji kanîkên , zîv û zêra.
xwîna dilê , pakrewana
bû wek xaçê , li ser dêra.
heger li dil , raser bikin
hezar şûr û nehsed kêra.
bi hevdûre , emê bêjin
bi yek dengî,weke mêra.
Kurd ti carî , li vê jînê
ji dest kesî , nagre xêra.
Kurd bi xwînê vedijîne
Omîda çavên Şilêra.
Em bi navê : BEREZANÎ
bi sawtirin , ji sed şêra.

*** * ***

23-10-1994

Ev helbest di kovara-GAZÎ-de,hejmar:6
Sal:1995 li:DIHOKÊ hatiye weşandin.

KURDISTAN

Kurdistan .....
çend hezar cara
bi destê neyar
di nav perdan de
tu ... hate ... kuştin .....
çend hezar cara
bilbil reviyan
ji nav baxên te .
di bin berfê de
ji bo rojek nû
hêlîn ... sar ... hiştin .....
çend hezar cara
tu bûye bûka
qîr û hewar .
deşt û latên te
bi xwîna hêvya
tev ... hatin ... şuştin .....
lê bi destê kurd
min bawer nedkir .
carkê ji cara
çira te vem're
xemla ala te
ji ser Perleman
bête ..... veşartin .....

* * *

Kurdistan .....
Carekê tenê
me xwe dît li pêş .
nav û dengê te
xewneke xweş bû
li ser rêçek dûz
bê ... newal ..û.. kaş .....
piştî wan sala
piştî kerwanê
soz û peymana
va..em..man..li..paş .....
em bûne kelem
em bûne dirî
di nav çavên hev .
hin ji me weryan
hin ji me revyan
hin ji me giryan
hin ji dijmin re
di bin navê te
bûn..rêber..û.. caş .....
ava kaniyê
berdan nav mala .

da zuha bikin
di hembêza te
çem.. û ..ciwa..aş .....
li ber dergehên
dêr û mizgefta .
li qorzîbira
der û hindira .
li goristana
li gulistana .
li şûna gula
pir bûn .. term ..û..laş.....

* * *

Kurdistan .....
qedera teye
piştî şahiyê
tu tim rakeve
bi wan çavê mest
di ... nav ... birîna .....
qedera teye
gulên baxê te .
wek berfa zozan
bibin nêçîra
germa ..... havîna .....
qedera teye
roka tey şermîn
bimîne winda
li paşya çiya .
serî dernrxe
ji ... nav ... nivîna .....
herdû lêvên te
ji destê demê
û kurmê darê .
wek mizgeftek sar
di şevên berfê .
bibin hêlîna
qîr ..... û ..... nalîna .....
qedera meye
yek kerwanê me
di bin barê xwe
nayê parastin
ji pelkên dawya
kom .... û ... civîna .....

* * *

Kurdistan .....
gemîvanên te
ji hev cuda bûn .
dîsa gemya te
kete nav destên
pêlên ..... bahozê .....
siwarêt gemyê

bûne du perçe .
hinek bi tirsin
hin lê napirsin .
xistin bin linga
kulîlka şaxê
peyman .. û .. sozê .....
xelat revandin
kiras çirandin .
hiştin li derya
jar û perîşan
bûka birîna
gula ..... Newrozê .....
xwezyên di dil de
omîd û hêvî
tev xewnên nêvî .
dane ber agir
da em windakin
berkên ristika
xebat ..û.. dozê .....

*** * ***

Kurdistan .....
xwîna şehîda
rû j' me dughere.
sîtava kêla
pişta xwe da me.
bi rondikên sar
ji ..me..xatir..xwest .....
pûç û lal bûne
mendal û kalmêr.
li ser hev digrîn
awaz ... û .. helbest .....
şûşa dilê me
wek carên berê
hat û derizî.
ji dest serxweşa
kete bin masê.
carek din dîsa
şûşa... me ...şikest .....
di nav xwîna xwe
em man li hêvya
dengê xêrxwaza.
di nav xwînê de
di nav agir de
me hevdû naskir.
bi çavin şermîn
çavin gunehkar
sist..û..jar..û..mest .....
heger çavên me
ji hev bitirsin.

êş û hêsrên me
li hev nepirsin.
tew gazin nabe
carkê ji cara
di rojên tenk de
ji.. kîna.... zordest .....

*** * ***

13-8-1994

Ev helbest di kovara-METÎN-de,hejmar:44
Sal:1995 li:DIHOKê,hatîye weşandin .

BARZANÎ

Evê helbestê dikim diyarî ji bo axa gora şehîdê kurd û Kurdistanê: Mistefa BARZANÎ

Bi xebata , pêncî salî
bi gernasî , bi mêranî
li ser dilê , miletê Kurd
te navê xwe ji mêj danî

dil buhişta , gelê jare
ey ronaka , taristanê
te geşkirin , li vê jînê
gulên baxê ,Kurdistanê

bi destê xwe, di dila de
arê hêvya,ka kê vejand
rûpelên diroka kurda
ji ûcaxa dijmin revand

kerkûk dilê kurdistane
lê kurdistan dilê teye
bi te cîhan em naskirin
tu nîşana milê meye
roka li sînga ezmana
bê te welat , bê nîşane
omîda dîl û hejara
tu sîtava , kurdistane

ey serwerê,pakrewana
li buhişta , kamîranî
li paytexta , azadiyê
te deng daye bi mêranî

li ser Qendîl, li Metîna
tu xuyaye , her êvara
bi ronîya , çavê tene
sûnda dost û evîndara

siwarêd pozê zozana
pêwanêd sînorê welat
mistek ji axa bapîra
ji kesîre , nekir xelat

kanîka ceng û xebatê
ferhenga jiyana kurda
pira rêka azadiyê
nûjdarê êşan û derda

ji ezmanê , Kurdistanê
roka te qet , naçe ava
her Adara , li gora te
em dişînin , sed silava

ji bona me te darek çand
jiyana xwe,te kir qurban
li ser şopa , tenî pîroz
bi hezara , ev jîn hêlan

pêşmergene,di şevên reş
ji bîrnakin , sûnd û sozê
Ya Kurdistan yan jî neman
bilind dikin , ala dozê

serî hilde , ji bin axê
dara te va , dipişkive
di hembêza, Kurdistanê
mendalek nû dilivlive

li newal û deşt û çiya
dîsa hêrîş û halane
xencera te di dest şêra
wa li jore , bê kalane

perdên bi destên neyara
va hilatin , ji dora me
pir nêzîke , mirna wana
ê ku dikolan gora me

fenerokên , Kurdistanê
ji nû dîsa , sor û geşin
gorên gernas û şehîda
bi me mizgeft û Laleşin

serî deyne , bi dilpakî
karwanê te , bi rêbere
jiyana mêr û lehenga
li bin ala ceng û şere

13-3-1992

Ev helbest,di kovara-METÎN-de hejmar:30
Sal:1994,li DIHOKê,hatiye weşandin.

BÛKA KURDA

Çi gulê ez , diyarîkim
ji bo bûka , gulistana
çi hêjaye , ez gorîkim
bo hêlîna , êş û jana
bûk bi gula , na xemile
di nav mijê , zivistana
sed hezar gul , ronî nakin
ew tarîka , li zindana
*** * ***
hek ji Hindê , li ser lêva
bo wê bînim , şîrê şêra
yan ji ezman , heyvê daxim
ji nav baxê , wan sitêra
bi van desta , ji zik derya
ez derînim , zîv û zêra
bûka xemgîn,dil geş nabe
dûrî sînga , şêr û mêra
*** * ***
ne Xanî me ,da bi rista
evîna wê , ez li darxim
ji dor pêlên derya Wanê
merşê gula , jêre raxim
heger bivê , ez tacên
Şahinşaha , li ber daxim
li baxê dil , bêk sor gule
ez ji bo wê , av û axim
*** * ***
Zab û Hêzil , têne xwarê
ji kanîkên , êş û derda
li kenara , kulîlk sorin
di nêv xwîna, genc û merda
pêlên xwînê, xweş çirandin
li dor bûkê , tîşên perda
li bin siya , alên hêvya
raketiye , bûka Kurda
*** * ***
30-8-1993

Ev helbest, di kovara-BIHAR-de hejmar:1
Sal:1994,li QAMIŞLO , hatiye weşandin.

DAXÊN...EVÎNÊ

Ê bi daxên,evîna dil,bête sotin
rizgar nabe , li vê jînê , ji xeyala
ne her peyva,li civata,ku tê gotin
dibe tacek , li ser serê , xort û kala
hîn ji çava,wek cobara,hêsir cotin
em bûn lîzkek,di nav destê,meh û sala
hêsrên yara,li meyxana,tên firotin
kes têr nabe, ji helbestên , wan peyala
*** * ***
her hêstirek,li ezmana,bû sitêrek
lê tu heyve , li nav ewrê , wan sitêra
her rondikek,di dil min de,bû birînek
bû nalînek , ji dor xaçê , li ser dêra
yar ji kesî,bi dirava,nayê kirîn
yar tê xwestin ,bi rewanê,gênc û mêra
ê bitirse , ji birînêt , pîj û xara
li gulzara , naghê gula , nav şilêra
*** * ***
dilê riswa,bi birîna,xweş xemilî
jan gihaye , ew omîda , di hinava
meh û sala,bi siwarî,dane pey hev
em têr nebûn , ji dîtina , herdû çava
me evîna ,herdû dila,daye destê
payîzoka , di nav pêlên , qîr û lava
jîneka dî,ji xwenên xwe,me peydakir
gul xemilîn , bi rondikên , bûk û zava
*** * ***

bêyî rewşa,xemla dêmê,gula şermîn
kî nasdike , zivistana , ji bihara
pakrewane,ê bê kuştin,bi mêranî
li vê jînê , di hembêza , dost û yara
kêlên gora,şermezarin,gunehkarin
bi qêrînin , bi hewarin , her êvara
bera axa,goristana,tenê bêje
ez dibhîzim , nalenala , evîndara
*** * ***
14-1-1994

Ev helbest,di kovara-ROJ-de,hejmar:5
Sal:1994,li QAMIŞLO hatiye weşandin.

MIN BAWER NEDIKIR

Min bawer ned'kir,
rokê ji roja,tu bibe neyar.....!
min bawer ned'kir,
pelik biweşin
ji şaxên jînê.
li min biçikin
di zivistana
kan'yên evînê.
bê xêz bimînin
di nav bahoza,ew gul û ew dar.....!
* * *
min bawer ned'kir,
kevir têkeve,şûna dilê te.....
ne ji bo min bûn
li hêvya min bûn
di şevên tarî,xêzên kilê te.....
bîne bîra xwe,
kê ji ezmana
ji bo gulyên te,sitêr daxistin ..... ?
kê di taryê de,
ji bo lêvên te.
bi hêsrên çava,helbest diristin...?
bîne bîra xwe,sed ax û hewar.....!
* * *
bîne bîra xwe,
kê rewanê xwe
di bin lingê te,hero dikir pir.....?
kê wer diparast
sîtavên çava,ji ber bayê kur.....?
çawa ew evîn..
ew gula rengîn..
ew tîn û ew bîn,di dil tede mir.....?
min bawer ned'kir,
ti car biçikin
li pêş çavê min,ew cem û cobar...!
* * *
min bawer ned'kir,
bi ser min de bê
di wê kîmkîmê,payîza xemgîn.....!
bibin nêçîra,
niklên qertela,ew birhên zêrîn.....!
min bawer ned'kir,
zer û hişk bibe,li min ew bihar.....!
* * *
tu bû feraşîn,
di kela germê...
tu bû pêt û tîn,

di berf û sermê...
tu bû beybûna,dawya Adarê..
tu bû Nêrgiza,
li jora taca,serê biharê....
tu bû perwana,
ser dêmê gula,xewna êvarê..
min bawer ned'kir,
tu dil bihêle , jar û birîndar.....!

* * *

dilê tenî jar,
min bi xwîna xwe,perde lê pêçan...
min ji kulê xwe,
li ser milê te,du gulî berdan....
ji bo xemla dêm,
min talan kirin,sed hezar hozan....
min bawer ned'kir,
rokê ji roja,tu bibe neyar.....!

* * *

17-2-1992

Ev helbest,di kovara-ZANÎN-de,hejmar:7
Sal:1993, li QAMIŞLO,hatiye weşandin.

Ferhad IÇMO :

Di sala 1960´î de li bajarê QAMIŞLO hatiye dinyayê, Li dibistanên bajarê QAMIŞLO xwendina xwe bi dûmahî aniye. Di sala1984´an de bawernameya-BEKELORYOS - di endazyariya şaristaniyê de ji zankoya HELEBÊ wergirtiye. Berî helbestê, dil ketiye mûzîkê û di sala 1970´ê de dest bi lêdana tembûr û gîtar û cumbişê kiriye.
Lê di 29.07.1978´an de helbesta xwe ya yekemîn bi navê –EY ZEMAN- daniye.
Di piraniyên kovar û rojnameyên kurdî de helbestên xwe weşandine û nêzîka çil helbestên wî bûne stran, bi dengê:
Mihemed ŞÊXO, Beha ŞÊXO, Adil HIZNÎ, Selah OSÊ, Isma'îl CUMA, Gulistan SOBARÎ û ŞEYDA.
Heta niha pênc pirtûkên helbesta çapkirine:
1- LÊMIŞTA ZOZAN 1988
2- PIŞTÎ ÇI 1995
3- EVÎNA TE 1998
4- LANDIK-1- 1998
5-PELÊN SIPÎ 2000
Pirtûka LANDIK- 2- ya helbestên zarokanî di bin çapê de ye.

NAVNÎŞAN
Ferhad Içmo
P.O.BOX:171-Kamishli- Syria
Tel: 00963 52422597 – 421012
Mobile: 00905367907929